Çi Kurdistanên serbixwe, çê nabin?

Dr. Ebdulbaqî Mayî

Van çend salên borîn, pir nivîsîn li ser kurdan û Kurdistanê li mesmedya cîhanî yên belav bûn. Di van heyaman de nexşên li berperên Internet li ser sinorên pêkhatina "Dewleta kurdî" ya ku ji mêje xewna hemû kurdan e, digerin û belav dibin. Gelek ji wan li Rojhelata Naverast, ji bo kurdan mafên dirustbûna dewleteka serbixwe bi rast û dirust dizanin. Her wesa ev boçune êmnahiya vê herêmê ya ku di dîroke de bi xwînrêtin û zordariyê hatiye desthelatdan bi dirustbûna dewleteka kurdî li evê herêmê girê didin.

Di evê gêlbeşoka ne bernamekirî de, em kurd yan yê li ser dehudoya xwe ku em ji xelkê hemûyan çêtirin û kesê mafê hindê nîne ku buhosteka axa Kurdistana me ya mezin bo xwe hisab bike, an jî em her gaveka berek li darekî li Rojhelata Naverast helingift dê bi lerz û tirs xwe bo revê amade bikin. Çunku ya ji me ve êdî hemû milletên dorûber dihêne talba me û careka dî çekê kimyewî li me bireşînin da qutbiriya me bikin. Hindek welatparêzên me yên rewşenbîr hind di hizrên xwe yên regezperêz dûr diçin ku daxwaza belavekirina erd û welatê me dikin li ser hisaba ereb û turk û farisan dikin. Ergumenta wan ewe ku derfeta alîkarkirina bi hêztirîn hikumeta cîhanê li evî demî ji dest xwe nekin û zalbûna rewşa xwe ya siyasî di evî demî de li Iraqê ji bo berjewendiyen xwe yên neteweyî bi kar bihînîn.

Di navbeyna evan her du boçunên layenperêz yên ji yek dûr de, xelkek yê ku dil diçe ax û avên me kurdan ya xwe li ber me vedaye û li derfetan digerin ku destkeftên xelkê me ji dest bihînîn der û pêyan li ser mafên me danin. Nimuneyek ji evan hewildnên dujminkar yên bitirs (bive) nivêsîneka profesorekê esil turk e, di (American Chronicle) da roja 9/5-2007 belav kiriye (*). Ev pirofesorê bê wîjdan înkara hebûna kurdan wek millet dike û hewil dide belge yên zanistî û dîrokî peyda dike li ser boçuna xwe ku kurd ne yek millet in. Hewlêrî û Aşutî û Hekarî û Rawanduzî wek zimanên cuda hisab dike û li ser hebûna van zimanan wek belge bo neyekbûna milletê kurd radiwestin.

Ev zanayê xwe di xendeka dujminatiya milletê kurd de dibîne pêdivî hindek zanayên ziman û dîroknasên kurdan e ku bersiva wî bidin. Ev rengê nivîsînan gelek ji şerekê leşkerî di evî demî da giringtire, çunku dê belga bi belga red bikin û ergumentan bi egumentan bişkênin.

Xwe hindek ji pisporên me xwe li ser van babetan terxan kiriba pitir ji şeredeva navxweyî ya bê mifa.

(*) Megalommatis, M.S. (2007). There cannot be an independent Kurdistan. American Chronicle,www.americanchronicle.com/articles/viewArticle.asp?articleID=26681.